Ziman û edebiyat

Zeynelabidîn Zinar

Ziman û edebiyata kurdî, du heyînên pîroz in ku çi car ji hev û du cuda nabin.

Dema mirov bi zimanê kurdî bipeyîve û heger li gor edebiyata kurdî reftar neke, seqetî di axavtina zimanê kurdî de çêdibe. Lewre bingeha herduyan, yek e. Heger yek ji wan bi cih nehê, yê din jî diherife.

Bala xwe bidinê, dema ji zanayê bi navûdeng Konfuşyusê Çînî pirsîne: "Heger tu ji bo îdarekirina welêt bihatibayî vexwandin, karê ku pêşî te yê bikira, çibû?" Weha bersiv daye:

"Bêguman, min dê bi destpêka kar re, ziman di ber çavan re derbas bikiriba. Lewre, heger di ziman de kêmasî hebe, bêje fikirandineke rind diyar nakin. Fikirandin jî ku rind diyar nebe, pêwîstiyên ku bihêne kirin jî, rast çênabin. Heger berpirsyarî jî ku rast nehête kirin, wê demê çand û edebiyat jî dirûxin û dad (edalet) jî dikeve riyeke şaş. Dema dad ji riya xwe averê bibe, xelk jî dê bikeve heyretê, nizane çi bike û nizane ku wê bigehe ku derê jî. Ha ji ber van sedeman e ku çi tişt mîna ziman girîng û bîrjiyan tune."

Ev yek jî diyar e ku çi kesê dema nû dihê dinyayê û dest bi jiyanê dike, hindek mafan jî bi xwe re dihîne; weke nijada xwe, zimanê xwe, edebiyata xwe û htd. Ev mafên henê, kes nikare ji mirov bistîne û nikare astengiyan jî ji mirovî re derxîne. Pişt re hin bi hin ew kes dibe xwediyê hin berpirsyariyan jî. Weke dana baca dewleta ku lê dijî, çûna leşkeriyê û htd.

Lê hindek dewlet û hêz hene ku van mafan qedexe dikin û zimanê xwe, edebiyata xwe û fermanên xwe dixin şûna yên bindestan û her wekî ku kiryarine rewa bin, di mejiyê wan de bi cih dikin, çi bi kesîtî û çi jî bi civakî be, wan bêgav dihêlin ku ew wek daxwaza ku ew dixwazin bilipikin. Ha wê demê, ji yê bindest/an du texlîtên mirinê derdikevin holê. Yek mirina civakî ye, ya din jî mirina kesayetî ye.

Mirina kesayetî, ji xwe diyar e ku mirov ji aliyê fizîkî ve ji dinyayê koç dike, yan jî didine koçkirin. Ev hawe, heger bi fermana Yezdanî be, zêde îş jê hilnaweşe. Lê gava mirina civakî çêdibe, hingê felaketa (kareseta) mezin derdikeve holê.

Li dinyayê gelek nimûne hene ku bi vî rengî gelek nijad ji holê rabûne. Karê ji holêrakirina nijadekê jî, pir hêsan e, kêm zêde 20, 25 sal in.

Çi dema dewleteke nijadperest, gava ji xwe re bike siyaset û bixwaze ku nijadeka din ji holê rake, ne hewce ye ku yeko yeko serê hemûyan bi şûr jêbike û laşê wan binax bike. Pêşî zimanê wan qedexe dike, çewa ku Turkiya zimanê kurdî qedexe kiriye û yê xwe bi kurdan daye fêrkirin, pişt re edebiyata xwe di şûna ya wan de bi wan dide pejirandin, hemû derfet û heyînên dewletê jî dixe xizmeta zimanê xwe û bi cihanîna edebiyata xwe di nava bindestan de, her tim wisa dike û her û her jî lê didomîne. Pişt re îcar 20, 25 sal şûnde, ew nijada bindest bi awayê civakî dimire û nijadeke din ango di rengê yê wê dewleta serdest de derdikeve holê.

Lê ez dibêjim, spas ji Yezdanê dilovan re ku ev şansê mezin yê kurdan heye ku kurd tev ne di nava nexşeya Tirkiya de ne. Vê yekê, parastin û êminatiyeka mezin daye kurdan.

Lê dîsa jî, îro li bakûr ziman û edebiyata kurdî ber bi rûxandinê ve diçin; tewrên civata kurd guheriye û ew şexsiyet û rêveçûna berî salên heştêyî, pir hindik li holê maye.

Têkiliya parastina ziman û edebiyata kurdî, zêdetir bi siyaset û siyasiyan ve tune. Her kurdê ji her çînê, xwedî maf e ku ziman û edebiyata xwe biparêze.

Ji salên şêstî heta yên 70 80-yî jî, li Tirkiya, di nava tirkan de, çi kurdê ku bi zimanê kurdî dipeyivî, kêmik dihate dîtin. Îcar niha jî, çi kesê ku bi zimanê kurdî dipeyîve, yan jî ku xwe kurd dihesibîne, herwekî ku ew "têrorist" be, dihê dîtin. Lê belê çawa ku pêngava pêşî bihurî, dê eva duyem jî bibihure.

Bêguman, ji bo parastina ziman û edebiyata nijadî, pêdiviya hebûna dewletê tune. Erê, çendî ku heger dewlet nebe, zehmet e ku xelkê normal bikaribe wan pîrozbahiyên xwe biparêze, lê belê va ye em dibînin, ev e ji gelek sedsalan ve ye bêyî ku dewlet hebe, kurdan heyînên xwe bi saya medrese, tekya û dîwanan parastiye. Lê mixabin ew parastin, ji 1980-yî ve rengê xwe guhartiye û ev teknîka nûjen jî ku jê re bûye alîkar, êdî mirina civakî li ber şêmûkê rawestiyaye.

Îro axaftina bi kurdî ji kurdan re, tenê ne bes e. Lewre heger mirov sed bêje ji zimanekî zanibe, ji bo afaxtina rojane têr dikin. Bi axaftina ziman re, bikaranîna edebiyata kurdî jî giring e û xwendina berhemên folklorî digel yên klasîk, rihê mirov yê nijadî dikewînin û pê reha nijada mirov jî xurt dikin. Ji van hemûyan zêdetir, dema mirov bi zimanê xwe dipeyîve, pir giring e mirov zanibe ku çima pê dipeyîve. Heger ew bîrûbawerî nebe, bi tenê axaftinê mirov nagehîne encamê.

Hêvîdar im ku bîrewer û rewşenbîrên kurd, tedbîrine xurt werbigirin û berpirsyariya xwe bi cih bînin. Her şad û bextewer bin.